09.07.2020
Rûpela 1 ji 4an

Pressestelle
Staatskanzlei 40213
Duseldorf
Têlefon 0211 837-1134
0211 837-1405
yan 0211 837-1151

presse@stk.nrw.de

**Danxuyandina çapemenîyê – 559/07/2020**

# Korona: Di astên sûcan de %23 kêmbûn

**Wezîr Reûl: Gava jîyana gelî hêdî dibe kêmtir tişt rû didin. Ev hema hema ji ber hemû sûcan derbasdar e.**

**Wezîrîya Hundirî vê danxuyandinê belav kir:**

Li Bakurê Ren-Vestfalyayê sûc kêm bûn – ji destpêka pandemîya koronavayrusê ve li gora jimarên sala bere jimara sûckirinê gelek kêm bû. Di nava destpêka Adarî îsal û paşîya Hezîranê de hemû li ser hev 365.676 lêpirsînên cezayî pêk hatine. Li gora heman dewra sala çûyî ferqa di wê 107.954 e. Yanî hema hema ji sedî 23 kêmtir bû. “Gava jîyana gelî hêdî dibe kêmtir tişt rû didin. Rûdana kêmtir lêpirsînên cezayî rûdaneke erênî ye. Digel ku jimar demkî bin jî em dikarin hinbihin meylên destpêkê bibînin.  Ev kêmbûn hema hema ji bo her cûrê sûcan derbasdar e.” Ev xuyandin ji alî Herbert Reûlî ve “di raporta bipêşveçûna koronavayrûsê” ya hema piştî dewra pêşîn a 2020î de hat eşkerekirin. Têkilîya vê rewşê bi bipêşveçûna sûcî ya gava pandemîyê û veguhestinên polêsî yên li ser Qaydeyên Parastina ji Koronavayrusê ve têkildar in.

Rabezînên malan bi kêmbûna %30yî ji 7.561î daketiye 5.290î. Jimara şêlandinan di wê gavê de bi kêmbûna %26an ji 3.819an daketiye 2.821î. Bûyerên berîkbirîyê bi kêmbûna %39an ji 10.638an daketina 6.511an. Sûcên ku qurbanîyên wan kesên pîr bûne bi kêmbûna ji sedî 11, ji 13.550yî daketine 12.104an.

Di tundîya nava malê de îsal di nava Adarê û Hezîranê de bi kêmbûna ji sedî 21î ji 13.230yî daketiye 10.479an.  “Divê em gelek hay ji jimartina xwe ya tundîya nava malê hebin û ji nêzîk ve çavdêrîya rûdanan bikin. Rawêj gelek eşkere ye: her ku gelek kez demeke dirêjtir nêzîktirê hev bimînin dê tundîya nava malê bêtir be.


"Lê jimar vê encamê nîşan nadin. Tiştekî gelek eşkere heye: polîsê NRWê guh dide hemû zanyarîyan," jî pê ve kir, Wezîr Reûl.

"Di xapxapokîyê û sextekerayê de hin guherîn qewimîne. Nemaze di destpêka pandemîyê de hin bûyer rû dane, sextekarî xwe wek rêncberên nivîsîngeha sihetê nîşan dane û têkoşîyane hin testên koronavayrusê bifiroşin. Awayê bi pêşmalka sipî yê sextekarîyên 'Ez nevîyê wî me," jî pê ve kir Birêz Reûl.


Binpêkirinên Qaydeyên Parastina ji Koronavayrusê di gava bêhnvedana Paskalyayê de û cara paşîn di gava paşhefteyên çûyî de li bajêr gihîşt asta herî bilind. Polis, di nava 25ê Adarê û paşîya Hezîranê de bi hezaran binpêkirin dan zanên û 50.587 kes bi nav kirin. Ji nava wan 36.837 kes mezin, 11.404 nûgihayî û 2.346 ji wan zarok bûn. "Gelek kes bi awayê nimûnebûyînê bi çistî tevdigerin. Dîsa jî digel kêmkirinan, ên qaydeyan pêk naynin hene. Sitandina hewaya paqij tiştekî fehmkirinê ye, lê pandemî hê bi dawî nehatiye. Li Bakurê Ren-Vestfalyayê gelek cîhên pirr xweşik hene û navê ku her kes li navenda bajêr bigihîje hev" jî pê ve kir Birêz Reûl.

Wezîr Reul, gava "leyîstikên xeyaletê" yên Bûndeslîgayê xuyand ku ew di binê tesîra alîgirên golingê de maye. Gelek ji van bê teşqele pêk hatin. "Em bi fikar bûn ka dê alîgir raperkeke çawa bidin. Û em gelek memnûn in ku gelek ji wan bi rewayî tevgerîyane. Têkildarbûna bi golingê re û parastina sihetê teqez di heman demê de mumkin e" jî pê ve kir Birêz Reûl.

Ji bilî balê kişand ser kombûnên binpêkirina Qaydeyên Parastina ji Koronavayrusê jî. Gava pandemî dest pê kir li dijî qedexeyîya pêbûnê xwenîşandayên rû dabûn. Lê yên ku xwe di meha Gulanê de xwe derxistin pêş, teorîsyenên komployê û komên tund ji nexuyayîbûnê feyde dîtin û hin ji wan tevgerên sûcî jî kirin. Ji ber kêmkirinên li herêma Guterslohê di zemanê nêz de kombûn qewimîn. Li Bakurê Ren-Vestfalyayê di nava mehên Adarê û Hezîranê de bêtirî 850 kombûn rû dan. Hema hema hemû li ser kêmkirinên texmenî yên Qaydeyên Parastina ji Koronavayrusê bûn.





Her yıl 01/03 ile 30/06 arası cezai kovuşturma sayısı





| | Tundîya navmalê | Şêlandin | Sûcên li dijî kesên pîr rûdayî | Berîkbirrî | Dizîya malê |
|---|---|---|---|---|---|
| 2018 | 12.854 | 3.781 | 9.737 | 10.476 | 7.804 |
| 2019 | 13.230 | 3.819 | 13.550 | 10.638 | 7.561 |
| 2020 | 10.479 | 2.821 | 12.104 | 6.511 | 5.290 |

Di sûcên cûrbicûr de jimarên bûyeran, her sal di nava 01/03 - 30/06 de | Jêder: ViVA/IGVP/FINDUS




Yaş grubuna göre tanımlamalar, 25/03. - 30/06/2020 arası




Di nava 25/03 û 30/06/2020 de: Binpêkirinên xuyandî yên li ser pandemîyê

***Eger çi pirsên we hebin ji kerema xwe bişînin nivîsîngeha çapemenîylê ya Wezîrîya Hundirî - têlefon: 0211 871-1111.***

***Ji bilî vê yek dikare ji vê sîteya înternetê ya Birêvebirîya eyalete jî xwe bigihînê vê metna çapemenîyê: [www.land.nrw](www.land.nrw)***

***[Siyaseta veşarîbûnê ya çapemenîya civatî]()***